

Grîpa bi dozeke bilind Hejmara 11 r

Agahî li ser vaksînelêdana grîpê ("grîp") ji bo kesên 60 salî û mezintir

(Rewş ji Cotmeha 2021-an vir ve)

Enfeksiyonên giran ên rêyên hewayê yek ji nexweşiyên herî giştî ne û ji aliyê hejmarek patojenên cihêreng, bi taybet vîrus ve têne çê kirin. Vîrûsa grîpê, ku sedema "grîpa" rastîn e, rolek taybetî dilîze û dikare her sal di forma giştî de dubare bibe. Li gorî patojenên din ên ku dibin sedema nexweşiya nefesê ya giran, vîrusên grîpê bi giştî dibin sedema heyamek nexweşiya giran. Parastina herî baş, vaksînelêdana bi wext e. Vaksînelêdana grîpê li hember nexweşiyên siviktir ên nefesê yê ku ji aliyê patojenên din ve têne çêkirin, neparêze.

Grîp nexweşiyek giran e ku bi tayê, kuxik û êşa masûlkeyê re hevrê ye ku ji ber sedemên klînîkî her gav ji nexweşiyên din ên nefesê re nayê cûda kirin. Bi giştî ji nişka ve û ji rewşek tenduristiyek bêkêmasî destpê dike. Maweyên klînîkî yê giran bi giştî di kesên ji 60 saliyê mezintir de, di kesên bi nexweşiyên kronîk de û di jinên ducanî de têne dîtin. Grîpa vîrusî di demsalên sar de zêdetir belav dibe. Ji ber vê yekê, vaksînelêdan divê bi giştî di mehên payîzê (bi tercîhî Cotmeh/Mijdar) de pêk were. Lêbelê, vaksînelêdana parastinê dikare her dem pêk were.

Vaksîne

Vîrusên grîpê gelek caran diguherin, ji ber vê yekê divê vaksîna grîpê her sal bi vaksîna heyî re were dubare kirin. Vaksînen ku ji bo grîpa demsalî her salê li gorî pêşniyarên Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) (World Health Organization) yê heyî têne çê kirin. Pêşniyar cûreyên vîrusên grîpa A û B yê ku li çaraliyê cîhanê de belav dibin, berçav didgirin. Vaksîna bi dozek bilind ku li vir tê vegotin herwusa tevheviyek ji du vîrusên grîpa tîpa-A (A/H1N1 û A/H3N2) û du vîrusên grîpa-B yê ku dikarin bi hev re çêbibin jî dihewîne. Lêbelê, heta eger wekî îstîsna, pêkhatiyên vaksîne di demsalekê de neguherin jî, divê vaksîn dîsa were nû kirin, ji ber ku herî zêde salek dom dike.

Ev vaksîna bi dozek bilind ji bo parastina li dijî grîpê di mezinên 60 salî û mezintir de destûrdar e. Ew bi karanîna hêkan tê hilberandin û divê çêtir e ku bi hundurê masûlkeyê (mil an ran) de were lêdayin, lê di rewşên kesane de dikare bi binê çermî de jî were lêdayin. Nabe vaksîne li nêzîkî nêkê an damarên mezin were lêdayin.

Eger ev vaksîna grîpê di gel vaksînen din re were lêdayin, divê yek li milê rastê û ya din di milê çepê were lêdayin. Ev dibe ku bi potansiyelî bertekên berevaniya kesane zêde bike. Doktora/ê vaksînekerê we dikare li ser vê yekê şîretan li we bike. Parastina vaksînelêdanê 2 heta 3 hefte piştî vaksînelêdanê dest pê dike.

Divê kî were vaksîn kirin?

Komîteya Daîmî ya Vaksînelêdanê (STIKO) pêşniyar dike ku hemî kesên 60 salî û mezintir li dijî grîpê bîn vaksîne lêdayin, çêtir e ku vaksînek bi dozek bilind were lêdayin, ji ber ku ew bi taybetî di xetereya grîpê de ne. Di vaksînek bi dozek bilind de 4 qat zêdetir ji vaksînen grîpê yê kevneşopî antîjenê vaksîne hene û ji bo kesên di temenê 60 salî û mezintir de parastînek çêtir radest dike.

Kî nabe were vaksîn kirin?

Kesê ku bi nexweşiyek giran (bi taybet enfeksiyona bi tayê) dikeve, divê tenê piştî başbûnê were vaksîne kirin. Kesên ku alerjiya wan a giran li pêkhatayan heye nabe werin vaksîne kirin. Wek nimûne, ev dikare di kesên ku bertekê alerjîk a giran li ser albumîna mirîşkê (spîka hêkê) hene, çê bibe.

Tevger berî û piştî vaksînelêdanê

Eger kesek bi gengaziya bertekê gera xwînê bin an jî yekser bertekê alerjîk nîşan bidin, divê berî vaksînelêdanê doktora/ê vaksînekerê xwe agahdar bikin. Carina gengaze kesek rasterast piştî (an jî berî) vaksînelêdanê wekî bersivê stresa hember derziyê bihiş bibin. Kesê ku vaksîne dibe, ne hewce ye ku di 3 rojên pêşîn ên piştî vaksînelêdanê de tedbîrên taybetî bigire, her çend dibe ku xwe ji çalakiya laşî yê neasayî xwe dûr bixin.

Bertekê alerjîk ên herêmî û giştî yê muhtemel

Piştî vaksînelêdanê, sorbûn û êşa herêmî ya li cihê vaksînelêdanê, û her weha qelsiya giştî, pir caran (ji %10 an zêdetir ji kesên vaksînelêdanê de) çê dibin. Êşa masûlkeyan û serêş jî gelek berbelav in. Bi giştî (1 heta kêmtir ji 10% kesên vaksînelêdanê) werimandin, hişkbûn û lekeyek şîn dibe ku li cihê vaksînelêdanê çê bibe, û dibe ku sar û tay (37,5 °C û zêdetir jî) çê bibe. Werima girêkê lîmfê li derdora cihê vaksînelêdanê de jî mimkun e. Carinan (ji 0.1 heta kêmtir ji 1% kesên vaksînekirî), gengaze ku li cihê vaksînelêdanê xwurîn û westandin hebe. Ev bertek bi giştî di 3 rojên pêşî yê vaksînelêdanê de çê dibin û di nav 3 rojên pêş de kêmtir dibin. Carinan, qelsiya masûlkeyan û westandin, û her weha nîşaneyên gastrointestinal (dilrabûn û vereşîn, îshal) têne şirove kirin. Gelek kêmtir (kêmtir ji %0.1 ji kesên vaksînelêdayî) qelsbûn an gêjbûn, êşa movikan û lingan çê dibin. Di hin rewşên takekesî de, nîşanên nefesê (wek kuxik, bêhnê, êşa qirikê) an êşa sîngî hatine ragihandin.

Bertekê herêmî û giştî yê ku li jor hatine destnîşan kirin, berteka xwezayî ya laş li hember vaksînelêdanê ne. Wekî qaîdeyek, ew demkî ne û zû û bê encam têk diçin.

Gelo bandorên neyînî ên ji vaksîne gengaz in?

Bandorên neyînîyê vaksîne encamên pir kêmtir in ku ji rêjeya normal ya bertekê vaksîne derbas dibin û tenduristiya kesê vaksînelêdayî bi girîngî xera dikin. Piştî vaksînelêdana bi vaksîna girîpê ya dozeke bilind, bertekê alerjîk wek mînak li ser çerm (xwurîn, pîzik, lîy) û rêyên hewayê gengaz e. Tenê di rewşên veqetandî de bersivên ji bertekê alerjîk ên bilez ên şokê re hatine ragihandin. Kêmtir caran dibe ku îltîhaba damarên xwînê çêbibe, an jî hejmarê trombêlan di xwînê de bi demkî kêmtir bibe, ku dibe sedema xwîn rijandinê. Bi heman awayî, bandorên demariyê tîkildarî vaksînekirinê di gotarên bijîjkî de (wek hestên nenormal, neuritis, felcên demkî, fêya bi an bê tayê) kêmtir caran hatine vegotin.

Şewirdariya doktora/ê vaksîneker li ser bandorên neyîniyê gengazî

Ji bilî vê belavoka agahdariyê, doktora/ê vaksînekerê we dê şîretan radestî we bike. Eger piştî vaksînelêdanê nîşanên ku ji bertekên herêmî û giştî yê demkî yê ku li jor hatine diyar kirin wêdetir derkevin holê, doktora/ê vaksîneker dê ji bo şewirdariya bêtir berdest be.

Hûn dikarin serdana doktora/ê vaksîneker bikin

Weşanker û ©: Deutsches Grünes Kreuz e. V., Marburg
(Pêşniyarên heyî yê STIKO bişopînin)
Berdestin di bin fermana Jimareya 11r ji:
DGK Beratung + Vertrieb GmbH
Biegenstraße 6, D - 35037 Marburg
Telefon: 06421 293-0, Telefaks: 06421 293-1 87

Vaksîne ya parastinî li hember girîpê – bi vaksîna doza bilind

Schutzimpfung gegen Influenza – mit Hochdosis-Impfstoff

Nav

Name

Berî vaksînelêdanê, ji kerema xwe agahdariyên kesane yê jêrîn radest bikin:

Vor Durchführung der Impfung wird zusätzlich um folgende Angaben gebeten:

1. Kesê ku divê were vaksînekirin niha saxlem e?

Erê Na

1. Ist die zu impfende Person gegenwärtig gesund?

ja nein

2. Gelo nexweş tûşî alerjîyek naskirî ye - bi taybet ji spîya hêkê (albumen)?

Erê Na

Eger erê, ji bo çi

2. Ist bei der Patientin/ dem Patienten eine Allergie – insbesondere gegen Hühnereiweiß – bekannt?

ja nein

wenn ja, welche

3. Gelo kesê ku tê vaksîne kirin bertekên alerjîk, taya bilind, an bertekên din ên neasayî piştî vaksînelêdana berê hebûn?

Erê Na

3. Traten bei der zu impfenden Person nach einer früheren Impfung allergische Erscheinungen, hohes Fieber oder andere ungewöhnliche Reaktionen auf?

ja nein

Eger hûn dixwazin li ser vaksînelêdanên girîpê - vaksînen bi dozên bilind - bêtir bizanibin, ji kerema xwe ji doktora/ê vaksînekerê xwe bipirsin!

Ji kerema xwe di wextê vaksînelêdanê de karta vaksînelêdana xwe bînin!

Falls Sie noch mehr über die Schutzimpfung gegen Influenza – mit Hochdosis-Impfstoff – wissen wollen, fragen Sie die Impfärztin / den Impfarzt!

Zum Impftermin bringen Sie bitte das Impfbuch mit!

Erêkirina rizamendiyê

Ji bo pêkanîna vaksînelêdana parastinî li dijî girîpê - bi vaksîna bi dozek bilind

(Formên kopiyên karbonî jî berdestin ku li gorî Qanûna Mafên Nexweşan kopiyek ji kesên vaksînekirî an nûnerên wî/wê yê qanûnî re radest bikin)

Einverständniserklärung

zur Durchführung der Schutzimpfung gegen Influenza - mit Hochdosis-Impfstoff

(Es stehen auch Formulare mit Durchschlag zur Verfügung, um der zu impfenden Person bzw. der gesetzlichen Vertretungsperson gemäß Patientenrechtegesetz eine Kopie mitgeben zu können.)

Navê kesê ku dibe were vaksînekirin

Name der zu impfenden Person

Jidayikbûyê

geb. am

Min naveroka belavoka agahdariyê nivîsandiye û hevdem ji aliyê doktorê min ve derbarê vaksînelêdanê de pir tê pêşniyar kirin.

Pirsên min ên din tune.

Ez bi vaksînelêdana pêşniyarkirî ya li dijî grîpê - bi vaksîna bi dozek bilind razî me.

Ez vaksînê red dikim Di derbarê encamên muhtemel ên vê redkirinê de ez hatime agadar kirin.

Ich habe den Inhalt des Merkblatts zur Kenntnis genommen und bin von meiner Ärztin / meinem Arzt im Gespräch ausführlich über die Impfung aufgeklärt worden.

Ich habe keine weiteren Fragen.

Ich willige in die vorgeschlagene Impfung gegen Influenza – mit Hochdosisimpfstoff – ein.

Ich lehne die Impfung ab. Über mögliche Nachteile der Ablehnung dieser Impfung wurde ich informiert.

Şirove:

Vermerke:

Cih, Roj:

Ort, Datum:

Îmzeya kesa/ê ku tê were vaksînekirin

Unterschrift der zu impfenden Person
bzw. der gesetzlichen Vertretungsperson

Îmzaya bijjîkî yan nûnerên wî/wê yê qanû

Unterschrift der Ärztin/ des Arztes